



Agirî Îsma`îlnijad:

“Kirîza te, ji min re derfet e”

»»» R:5



Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (328)21-06-2018 Buha (1000) Tûmen

Derketina Amerîkayê ji rêkkevîna navîkî

»»» R:3



Demîrtaş: Ez 20 salên
din jî girtî bim, ez serî
natewînim

»»» R:12



Nasnameya ber ba

»»» R:2



Mistefa Hicrî:

Hêza me

xelkê me ye



Roja Yekşemiyê
10.06.2018
(20.03.1397) an birêz
Mistefa Hicrî lêpirsyarê
giştî ê PDKÎ li ser dax-
waz û vexwandina fermî
ya dewleta Amerîkayê
gihîşte wî welatî.

Mistefa Hicrî lêpirsyarê
giştî ê PDKÎ di destpêkê
de, digel heyeteke ro-
jnameya “Washington
Post”ê civiya, û serdana
kongireya Amerîkayê jî
kir.

Mistefa Hicrî lêpirsyarê
giştî ê PDKÎ di vê civînê
de rewşa Îran û Rojhilata
kurdistanê şirove kir, û
bas ji vê kir ku rejîma

Îranê zexteke zêde xis-
tiye ser neteweya Kurd, û
ew zulm û zordariya wê
rejîmê jî, ji aliyê medy-
ayên cîhanî ve gellek kêr
giringî pê hatiye dan.
Mistefa Hicrî lêpirsyarê
giştî ê PDKÎ piştî civîna
digel vê heyetê, serdana
kongireya Amerîkayê
jî kir. Mistefa Hicrî
di axavtina xwe de bo
senator û kongirêsmenên
Amerîkayê şirove kir,
ku dema vê hatiye ku
destewajeya guherîna re-
jîmê li Waşingtonê û pay-
textên welatên Rojavayî
bihê bihîstin. Navbirî bas
ji vê kir ku dema em bas
ji guherîna rejîmê dikin
mebesta me, ne ew e ku

bên û rejîmê ji me re bigu-
herin, belku mebest ew e
ku xelkê Îranê gihîştine vê
qena`etê, ku dixwazin vê
rejîmê biguherin, û gihane
vê astê ku vê rewşê êdî
naxwazin. Xwenîşandan û
daketina xelkê ser kolan-
an, di heyama çend mehên
borî de, û ew diruwmên ku
hatin dan, nîşanderê vê ne
ku xelkê Îranê gihîştine vê
qena`etê ku dibe ew rejîm
li ser kar nemîne.

Mistefa Hicrî lêpirsyarê
giştî ê PDKÎ bas ji vê
jî kir ku daxwaza me ji
Amerîka û Ewropayê ew
e ku nabe vê rewşa heyî
qebûl bikin, û ji riyekê
bigerin bona pêwendiyên

bi Îranê re, belku dibe
riyekê bibînin bona vê ku
alîkariya xelkê Îranê bikin
da ku vê rejîmê biguherin.
Herwisa bîr ji vê bikin, ku
digel dewleta bê ya Îranê
digel sistemeke nû ku cihê
vê rejîmê bigre, serederiyê
bikin.

-Roja 15.03.1397`an jî
Mistefa Hicrî serdana
Wezaretê Karê Derve a
Amerîkayê kir, û digel
ofîsa Îranê û beşa mafê
mirov û demokrasiyê kom
bû.

-Roja Duşemî 11`ê He-
zîrana 2018`an, Şevra
Pêwendiyên Derve ên
Amerîkayê civînek der-

heqê pêşeroja Kurdistanê
Rojhilatê de bi rê ve bir.
Di vê civînê de “Mistefa
Hicrî” bas ji vê kir ku:
“Em weke PDKÎ, xwen-
dîn û zanyarî li ser vê
rejîmê me hene, û ezmûna
pêşniyara gotûbêjan û şerê
çekdarî digel rejîma Îranê
me hebûye, me guman
derheqê vê rastiye de nine
ku rîya rizgariya xelkê
Îranê digel hemû pêkhat-
eyan, û herwisa vegeri-
yana aşî û aramiyê ji bo
deverê bi rîya nemana
Komara Îsalmî a Îranê
re derbaz dibe. Ji bilî vê
yekê her cure pilanek bi
armanca guherîna siyas-

»»» Dom R:7

Sergotar**Nasnameya
ber ba**

N: Kerîm Perwîzî

Nasnameya hevbeş ku xelkê erdnîgariyeke siyasî, xwe pê didin nasîn, yan pênaseya wan e li hemberî xelkê din, faktera herî girîng a domandina pêkvejiyanê ye, ku xwarbûna vê fakterê, gellek bingehan dixê metirsiyê de.

Li ser erdekê ku tê de dijîn, xelkê cihanê bona pêkvejiyanê hewcehiya wan bi îdarekirin û birêveçûna yasayê hebûye, û di vê pêxemê de jî, bona vê ku deshilatek hebe ku yasayekê bi cih bike, yan yasayeke bicîhkirî bi rê ve bibe, bona vê dewlet hatiye çêkirin, û sînorên xakî û avî ên deshilata dewletê jî, welat pêk anîye.

Di nava her welatekê de jî xelkê akincî ê vî welatî yan nasnameyeke hevbeş hene, yan deshilateke cihgirtî hewl dide ku nasnameyeke hevpar ava bike, da ku bi awayê hestpênkirî (bi bê haylixwebûn), xelk yasayan cîbicî bike.

Di erdnîgariya siyasî wekî Îranê de jî, deshilatên hewl daye ku nasnameyeke hevpar bo xelkê nava vê erdnîgariyê ava bikin. Lewra dibêjim çê bikin, jiber ku erdnîgariya siyasî ya Îranê ew taybetmendiya nine, ku hemû xelkê wê, bi awayê xwezayî nasnameyeke wekhev ya hevpar wan hebe, belku welatek e bi hebûna xelkê cuda ku çend nasnameyî ne.

Ew çend nasnameyiya xelkê di Îranê bûye sedema pêkhatina kêşeyan ji bo deshilatdarên welat. (Lewra nabêjim deshilatdarên navend, jiber ku navendbûn bi deshilata cihgirtî nine, bi taybetî di Îranê de, deshilat deshilateke nerewa ye, lewra taybetmendiya navendbûnê nadê, belku pênaseya deshilata dasepayî baştir dinasîne).

Dersxwanên mekteba Pêşewa dirêjîderên rêbaza Demokrat in

Desteyek ji xortên şoreşger piştî derbazkirina dewreya 230 a destpêkî ya pêşmerge, li ser çiyayên Kurdistanê kincê pîroz ê pêşmergatiyê li xwe kirin.

Nûçegihaniya malpera “1Kurdistanmedia”yê ji çiyayên Kurdistanê ragehand ku roja Şemiyê rêkewt 19’ê Cozerdanê, cejna bidawîhatina dewreya destpêkî ya pêşmerge li ser çiyayên Kurdistanê bi rê ve çû. Ew merasima taybet ji ber vê ku destyek ji lawên şoreşger ên Kurdistanê tevî refên pêşmergeyên PDKÎ bûn, û çeka bergirî ji şerefê avêtin mile xwe, bi rê ve çû. Destpêka merasimê bi sirûda neteweyî ya “Ey Reqîb” û ragirtina deqeyekê bédengî bona rêzgirtina ji riha pak ya şehîdên Kurdistanê dest pê kir.

Piştî “Dr. Awat Saroc” endamê Navenda Siyasî ya PDKÎ çend gotinek bi vê boneyê ve pêşkêş kir. Piştî sirûdeke şoreşgerane li jêr navê “Ey Pêşmergeyê helmetber” ji aliyê beşdarên dewreyê ve hate pêşkêşkirin. Di beşeke din ya vê merasimê de, rapora perwerdehiyê ya dewrê ji aliyê Muxtar Qadirpûr yek ji mamostayên fêrgehê ve hate xwendin, û kar û çalakîyên perwerdehiya dewrê ji bo beşdaran hate xwendin. Di beşeke din ya vê merasimê de, peyama dewreyê ji aliyê beşdarê dewrê Rehman Selîmî ve hate xwendin. Piştî sirûdek li jêr navê “Min Demokratim” ji aliyê Ce’îfer Mihemedî ve hate pêşkêşkirin.

Helbestek jê li jêr navê “Min tewartî serbestîm” ji aliyê beşdarê dewrê Baran Sofî Ehmedî ve hate pêşkêşkirin. Herweha Evîn Hekîmpûr yek ji pêşmergeyên Hêza Tayabet pexşanek pêşkêş kir. Piştî pêşkêşkirina van vehunandinan, sirûdek li jêr navê “Di çepera pêşmerge de” ji aliyê beşdarbûyîyê dewrê Seywan Îsma’îlzade ve hate pêşkêşkirin. Ew merasim bi nîşandana hin herektên taybetî ên leşkerî bi dawî hat.

Her deshilatekê hewcehî heye ku biryaran guhdarî bike, û serî jê re bitewîne, lê deshilata dasepayî di Îranê de li ber çend nasnameyîbûna xelkê, ew poan tunebûye, û xelk serî bo biryaran natewînin.

Li ber vê kêşeyê hewleke zaf dane, ku nasnameyeke hevpar ya destçêkirî di Îranê de ava bikin, û bi nav rewşenbîr, û siyasî û deshilatdar, di heyama nêzîk bi sedsalekê de, hewl dane, ku Îranîbûnê pênase bikin, û yek nasnameyî bi xelkê Îranê ve xûya be. Bo vî karê xwe jî hemû bingeh û fakterên baş ên ferhengî ên neteweyên din (ji dîtingeha xwe ve baş)dizî ne, û kinçeke farsî kirine ber de, û fakterên din ên neteweyan bi paşvemayî zanîne, û bi vî rengî viyane ku bi dizî, deskarî, û sivikatiyê, nasnameyên din bihelînin û nasnameya destçêkirî ya Îranî bi ser xelkê de bisepînin.

Ew rewta dîrokî heya niha jî serkevtî nebûye, û şikest xwariye, û niha zêdetir ji hemû demekê, netewe di Îranê de, li pey taybetmendiya xwe de ne, û Îranîbûnek ku pênaseya dadperwerane û wekhev bibexşe hemû xelkê, heya niha pêk nehatiye.

Îranîbûn serdemekê dikare nasnameya hevpar hebe, ku hemû neteweyan bi yek çavî bibîne, û çî yek ji wan bi ser yê din de nehê sependin, û bi baştir nezane ji yê din, û hemû wek yek di deshilata cihgirtî de beşdar bin, hekî, ne wisa be, tu yek ji wan nasnameya bizorî qebûl nakin. Îranîbûn dibe ku federalîzma dilxwazane û çend neteweyîbûna erdnîgariya siyasî ya Îran tê de hatibe cihkirin.

Derketina Amerîkayê ji rêkvevtina navîkî



Mistefa Hicrî: Xelkê Kurdistanê Îranê û PDKÎ pîlan hene ku xebata xwe mil bi milê xebata seraserî li Îranê li dijî Komara Îslamî bihêztir û cemawerîtir bikin.

Mistefa Hicrî lêpirsyarê giştî ê PDKÎ di Şêvra Pêwendiyên Derve ên Amerîkayê de gotarek pêşkêş kir, û di axavtina xwe de bas ji rewşa Kurdistanê Rojhilat û siyasatên rejîma Îranê derheq Kurdistanê kir.

Deqa gotarê weha ye:

Bi sedema taybetmendiyên navendîtî û rola diyar û yekalîker ya îdeolojiya wê, rejîma Komara Îslamî ya Îranê hewl daye, ku nasnameya siyasî, û bingeheên fikrî xwe li dijî nasnameyên din pênas bike. Yasaya bingeheên ya Îranê pêkhatî çê kiriye, ku bi awayekî sistematîk ferq û cudahîdanînan yasayî û cihgir dike. Mînakê ji vê ferqdanîne ew e ku li gora yasayê tenê ew kes dikarin ku bibin serkomar ku bawerdar bin bi ayînzaya Şî'etiyê. Bi vî rengî Kurdên Sunî û Yarsan ji bilî van ferqdanînan stema neteweyî jî li ser wan çend qat e.

Stema neteweyî li Îranê du faktor li piştê ne, yekem pêkhatîya hikûmetê û deshilatê, û duyem jî bi nav rewşenbîrên hikûmetî ku palpiştîyê jê dikin.

Destepeya "herêmên qewmî" piştî şoreşa gelên Îranê û ji aliyê bi nav rewşenbîr û siyasîyên hikûmetê bo nasandina van navçeyan bi kar hat ku cihê akincîbûna neteweyên xeyrî Fars bûn. Vê dîtingehê ser ji nû Îran bi ser navend û derdorê de parve kir. Ew dîtingeh dikeve çarçoveya siyasatê ku bi siyaseta fermî û qewmî ya rejîma Îranê tê nasîn. Yek ji van pîvanên ku di basa stema çend qatî ya neteweyî de pişt pê tê qahîmkirin, biyavê aborî ye, wate lînihêrînek bo piroseya vegeşandinê û avedankirina parêzgehên Kurdistanê Îranê û hevberkirina wan digel hemû parêzgehên Îranê, aliyên curbicur ên van ferq û cudahîdanînan derdixe.

Kurdistanê Îranê

Kurdistan di tewahiya xwe de, navçeyekê emnî û milîtarîzekirî ye. Bajaran reng û rûyê padgan û binkeyên leşkerî bi xwe ve girtine. Ew yek jî bûye sedema vê ku her cure berhemên (sermayedanînek) heta ji aliyê Kurdan bixwe ve jî digel astengiyên mezin berbirû bibe.

Di serdema Pehlewîyê yekem û duyem û Komara Îslamî de, tevî hewla berdewam bona guherîna pêkhatîya erdnîgarî û demografiya Kurdistanê, bajar û herêmên din jî kêmtirîn asta vegeşandin, û pêşkevtinê bi xwe ve dîtîye. Pîraniya wan kargehên biçûk ên aborî ku li Kurdistanê ne, ji aliyê xelkê nexweçihî (bîhanî) û kêmtir xelkê xweçihî ve hatiye danîn. Nebûna rê û banan, û jêrxana hatûcûnê wisa kiriye, ku ew kargeh tenê erdnîgarîyêke biçûk bibe bazara wan.

Bedela vê ku bi armanca dabînkirina kar ji bo xelkê bêkar ê Kurdistanê, li rex çavkaniyên xwezayî û me'idenî karxane bîne avakirin, pîraniya çavkaniyan, û berhemên wê bo derveyî Kurdistanê têne şandin.

Çend mînak

Zêrê Zerşoran (hilkevî di navçeya Hewşar ya parêzgeha Urmîyê) ku wekî meztirîn kangeha zêr ya Îranê tê hesibandin, bo navendê tê şandin. Yan jî kevîrê Xanê, û hesinê Seqîzê ku bi heman şeweyî bi xawî bo navenda Îranê tê şandin. Eva di demekê de ye ku Kurdistanxwedîyê zêdetirîn rêjeya destengî û bîkariyê ye.

Hilnegirtina mîn (mayîn)ên di nava zewiyên çandiniyê ên Îlam û Kirmaşanê de, ku hem zirara canî bo xelkê heye, û hem jî zewiyên xelkê ji nav diçin, û nikarin çandiniyê tê de bikin. (1) Parêzgeha Kurdistanê bi hebûna

%18.8 nifûsa akincî li qeraxa bajarên, di asta Îranê de pileya yekem heye, ew rewşa bi awayekî metirsîdar e ku di navbera salên 2004-2010'an ji aliyê banka cîhanî ve pere jê re hatiye diyarîkirin. Ew parêzgeh serbarê dewlemendbûna bi çavkaniyên xwezayî û potansiyeleke bilind bo vegeşîna pişesazî, yek ji wan navçeyên paşvemayî di biyavê pişesaziyê de ye. (2)

Di heman demê de û di biyavê pişesazî de, nebûna karxane û pişesaziya bingeheên di navçeyên Kurdî, nerazîbûneke zaf lê ket. Di vir de em dikarin du mînakên bidin. Di van çend salan de sazîkirina karxaneyên qalkirina hesin li Qurwe ji bilî vê ku beşeke zaf ji birêveber û kedkarên wê ji kesên din ên herêmê bûn, bi sedema lawaziya birêvebirin û piştgirînekirina hikûmetê hate paşxistin. Di heman demê de sazîkirina petroşîmiya Mehabadê çî deskevtek bo navçeyê tunebû. Jiber ku heta kedkarên sade jî ji derveyî Kurdistanê bo anîne.

Mifahwernegirtina ji potansiyelên Kurdistanê hevdem bû digel parvekirineke newekhev ji van derfetên bo vegeşandinê hewce ne. Ew sedem jî awarebûna Kurdan li pey xwe hebû, û hêza kar û bijardeyên Kurd neçar kiriye wargehê xwe bi cih bihêlin, û ber bi navenda Îranê û herwisa derveyî vî welatî koç bikin. Bo mînak parêzgeha Kirmaşanê piştî Xûzistan û Loristanê zêdetirîn koçberbûna navxweyî di Îranê de heye (her sal zêdetir ji 50 hezar kesî). Koçberbûna ciwanan bo dîtina kar, bûye sedema bilindbûna rêjeya nifûsa bîtemen a Îlamê. (3) Rastiyên sistema bernamerêjî bo vegeşandinê di Îranê de îşareyê bi vî dikin, ku piroseya darêtina bernamê û pîlanên demdirêj bo vegeşandinê li jêr bandora ferq û cudahîdanîna sistematîk (navend û derdora bajar) de ye, bi awayekî ku parêzgehên Kurdî wekî qer-

axbajaran lê hatiye. Her ew mijar bûye sedema vê ku hemû çavkaniyên deshilatê li navendê kom bibin, û çavdêriya hûr ya hikûmetê rêgir bûye ji vî civaka medenî û kertê taybet (xisûsî) bikarin azadiyê bidin çalakiyên aborî, siyasî û medenî.

Her şewê çalakiyek dibe ku bi pejirandin û çavdêriya hûr ya hikûmeta navendî be, û her li ber vî siyasat û dîtingehê, sermadanîn bi wateya wê ya giştî berbirûyê kêşeyan û astengiyên dibe. Çirrbûna deshilatê li navend û herwisa dîtingeha emniyetî bo Kurdistanê, bûne sedema vê ku potansiyelên van ciyan, bîne piştguhixistin. Di biyavê torîstî de parêzgehên Kurdistanê bi hebûna xwezaya bê mînak û rewşa ciwan û dilrevîn şiyana vî heye ku bibe cemsereke bihêz ya geştîyarî, lê bedela veguhastina vî derfetê bo vegeşandinê van navçeyan, ew parêzgeh tenê wekî cihekî bona sazîkirina bendavan lê tê nihêrîn. Bendav ne bi armanca vegeşandinê çandiniyê û bihêzkirina kertê torîstî, belku tenê bona vî ku ava wan navçeyan bo parêzgehên hişk ên navneda Îranê bê veguhastin. Ku wisa bû li ser hesaba nevegeşandinê Kurdistanê navçeyên din têne avedankirin. Bi kurtî di encama siyaseta cudahîdanîne û stema çend qat, Kurdistanê Îranê li rîza herêmên herî hejar û geşenekirî de ye ku di vir de bi piştqahîmiya bi amarên fermî wêneyeke giştî li ber çavan tê raxistin:

Parêzgeha Sine pileya sêyem a bîkariyê heye (4). Amarên bîkariyê li bajarên parêzgeha Kurdistanê li serweyî %60 e. Kurdistan di biyavê amara bîkariya serkevtiyên zankoyê, pileya yekem heye (6). Destengî û bîkariyê şîrazeya malbatan hilweşandiye (7) li deh bajarên Îranê de ku zêdetirîn amara bîkariyê tê de heye, 7 bajar li Kurdistanê hilketîne (8). Bi awayekî navgîn mehane 6 kolber têne kuştin, û 12 kes jî birîndar dibin (9). Bîkarî di parêzgeha Îlamê ber bi kirîza civakî ve diçe (10). Îlamê di xweşevitandinê de pileya yekem a cîhanî heye, û di xwekujiyê de pileya yekem ya di asta Îranê de heye (11). Yek li ser çar a akinciyên Kirmaşanê bêkar in (12), Kirmaşanê pileya yekem

ya bêkariyê di Îranê de heye (13).

Serbarê vê rewşa bîzemet ku di bin bandora pîlandarêjiyeke armanedar bo xelkê Kurdistanê pêk hatiye, serkuta sistematîk û tirsandin bi awayekî gellek tundtir ji beşên din ên Îranê tê de tê peyrewkirin. Her cure nerazîbûnek bo dabînkirina kar, nehêlana siyaseta cudahîdanîne, nehêlana rewşa emniyetî û tundûtîj, heta xwendin bi zimanê dayîkê (ku di yasayê de hatiye) hevber e digel tawanên wekî: Cudahîxwaz, dijîşores, kirêgitiyê dijminên Îranê û ... hwd, û cezayê giran wekî îdam, girtina dirêjheyam, û destbiserdegirtina darayî, û ...hwd.

Tevî van siyaseten rejîmê di navxwe ya Îranê de, destêwerdanê di nava karûbarên welatên derve û hewldana bo bihêzkirina nîfûz û deshîlata navçeyî û şandina derve ya şoreşê sedemke serekî ya pêkanîn û belavbûna şer û pevçûnên tayîfî ye di navçeyê de, ku di encamê de kuştin, birîndarbûn, û awarebûna dehan milyon kesî û têkrûxana aborî, civakî, û guherîna demogirafiya beşek ji van welatan li pey xwe hebûye. Siyaseta serkut û ferqdanîna di navxwe û têkdan û destêwerdan li derveyî sînoran, li ser bingeha fikrî û îdeolojîk ên rejîmê hatiye danîn, û beşeke cudanekirî ye ji jiyana siyasî ya Komara Îslamî ya Îranê û di pêşerojê de jî berdevam dibe.

Di derbazbûyê de ew kiryar û siyaseten rejîmê ji aliyê navendên biryarder, û kom û komeleyên navdewletî û rêxirawên berevankarê mafên mirovan ve hatiye mehkûmkirin, û cezaya giran ya aborî û siyasî jî bi ser de hatiye sepandin, bi vê hêviyê ku (rejîm siyaseten xwe biguhere) lê hekî guherînkariyek di siyaseten wê de rû bide, guherîn bûye ber bi tundtirkirina van siyasetan. Jiber ku rejîm li gora îdeolojiya xwe, kiryarên xwe ne tenê her xirab û şaş nizane, belku berpirsayerî heye di guherîn yan lawazkirina hikûmetên din ên cîhanê, bi taybetî welatên Misilmanên cîhanê ku wekî xwe nafikirin. Lewra di her cihekî de rewteke îdeolojîk yan girûpeke ayînî ya hevhezrê xwe bibîne, di hemû biyavekê de wan bihez dike, û wan han dide (tûj dike) bo çekirina fitne û şer û nexweşiyên, û nearamî û şerê tayîfî, ku mînak wê Hizbullaha Lubnanê ye.

Em wekî PDKÎ bi xwendin û zanyariyekê ku li ser vê rejîmê me heye, û ezmûna pêşniyara gotûbêjan heta şerê çekdarî me digel de hebûye, me guman li ser vê rastiyê nine, ku riya rizgarbûna xelkê Îranê bi hemû pêkhatên xwe ve, û herwisa veşeriyana aşî û aramiyê bo navçeyê ji rêvea nemana Komara Îslamî re derbaz dibe. Ji bilî vê yekê her cure pilanek bi armanca “guherîna siyaseten rejîmê” tenê xesarên zêdetir digehîne xelkê Îranê û welatên cîhanê, û derfeta zêdetir pêk tîne, ku rejîm bandor û amadeyiya xwe di navçeyê de zêdetir bike.

Girêbesta Bercamê ku di navbera Îran û YE û girûpa 5+1 di 14.07.2015`an de hate wajokirin, bi awayekî zelal nîşan da ku vêdebirina dorpêçên navdewletî li ser vî welatî û ew dahata ku bi sedema vê rêkvevtinê dest wê ket, berevajiyê çavniheriyên, ji bilî vê ku alîkar bû bona serkut û zexta zêdetir ya Komara Îslamî di navxwe û hilkişiyana zêdetir ya asta bêkariya ciwanan, girantirbûna hewcehiyên rojane ên xelkê û daketina bêmînak a nîrx û buhayê pereyê Îranê, li derveyî sînoran jî alîkar bû bona bihêzkirina girûpên terorîstî ên aligirê rejîmê, û berdevam şer û têkderî û rikeberiyên heta piştî têkşikandina DAÎŞ`ê û paşekêşepêkirina wê.

Bi vê lîniherîna li ser rejîma Komara Îslamî, em vekîşiyana Amerîkayê ji vê rêkvevtinê bi biryara Trump û bi armanca lawazkirina vê rejîmê ji hemû aliyan ve, em bi pêngaveke erênî dihesibînin, û em hêvîdar in ku civaka navdewletî jî di vî warî de, alîkarê Amerîkayê bin. Lê pêngava duyem ku di vê rastiyê de û bona tewawkireina pêngava yekem em bi hewce dizanin, piştevanîkirina cidî ye ji pêla nerazîbûna xelkê Îranê, ku bi taybetî di heyama sala borî de geşe kiriye, û roj bi roj kûrtir dibe. Rojava û bi taybetî Amerîka nabe ku xelkê Îranê li hemberî serkutkirina rejîmê û pîlanên din bo bîdengkirina rewta neraziyên, bi tenê û bê piştevan bihêle.

Xelkê Kurdistanê Îranê û PDKÎ wekî hizbeke xwedîdîrok û pêgeha xelkî, bi ezmûneke zêdetir ji 70 sal xebata li dijî du rejîmên Pehlewî û Komara Îslamî pilan heye ku xebata xwe mil bi milê xebata seranserî li Îranê li dijî Komara Îslamî bihêztir û cemaweritir bike.

Em vekîşiyana Amerîkayê ji vê rêkvevtinê bi biryara Trump û bi armanca lawazkirina vê rejîmê ji hemû aliyan ve, bi pêngaveke erênî dihesibînin

Bo vê meremê, heyama salekê ye ku wekî hizbên opozisyona Kurdî ya Îranê “Navenda Hevkariya Hizbên Kurdisatna Îranê” me bo xebateke bibandor li dijî rejîma Komara Îslamî pêk aniye, û bi hevahengiyê zêde ve digel hevdu kar dikin.

Çavkanî:

- 1-<https://www.jamaran.ir/%D8%A8%D8%AE%D8%B4%D8%A7%DB%8C%D9%84%D8%A7%D9%85-196/708966-%D9%81%D8%B9%D8%A7%D9%84%DB%8C%D8%AA-%DA%AF%D8%B1%D9%88%D9%87-%D9%BE%D8%A7%DA%A9%D8%B3%D8%A7%D8%B2%DB%8C-%D8%A7%D8%B1%D8%A7%D8%B6%DB%8C-%D8%A2%D9%84%D9%88%D8%AF%D9%87-%D8%A8%D9%87-%D9%85%DB%8C%D9%86-%D8%AF%D8%B1-%D8%A7%D8%B3%D8%AA%D8%A7%D9%86-%D8%A7%DB%8C%D9%84%D8%A7%D9%85>
- 2-Pîrsa nasîna stratejîk ya veşîrîna di parêzgeha Kurdistanê, navneda lêkolînên stratejîk
- 3-<http://www.irna.ir/fa/News/82546108>
- 4 - <https://www.ilnanews.com/%D8%A8%D8%AE%D8%B4-%DA%A9%D8%B1%D8%AF%D8%B3%D8%AA%D8%A7%D9%86-101/579507-%DA%A9%D8%B1%D8%AF%D8%B3%D8%AA%D8%A7%D9%86-%D8%A7%D8%B2-%D9%86%D8%B8%D8%B1-%D8%B4%D9%85%D8%A7%D8%B1-%D8%A8%DB%8C%DA%A9%D8%A7%D8%B1%D8%A7%D9%86-%D8%B1%D8%AA%D8%A8%D9%87-%D8%B3%D9%88%D9%85-%DA%A9%D8%B4%D9%88%D8%B1-%D8%B1%D8%A7-%D8%AF%D8%A7%D8%B1%D8%AF>
- 5-<http://kordestan.isna.ir/default.aspx?NSID=5&SSLID=46&NID=31009>
- 6-<https://www.tasnimnews.com/fa/news/1396/10/06/1613116/%DA%A9%D8%B1%D8%AF%D8%B3%D8%AA%D8%A7%D9%86-%D8%A8%D8%A7%D9%84%D8%A7%D8%AA%D8%B1%DB%8C%D9%86-%D8%A2%D9%85%D8%A7%D8%B1-%D8%A8%DB%8C%DA%A9%D8%A7%D8%B1%DB%8C-%D9%81%D8%A7%D8%B1%D8%BA-%D8%A7%D9%84%D8%AA%D8%AD%D8%B5%DB%8C%D9%84%D8%A7%D9%86-%D8%B3%D8%B7%D8%AD-%DA%A9%D8%B4%D9%88%D8%B1-%D8%B1%D8%A7-%D8%AF%D8%A7%D8%B1%D8%AF>
- 7-<https://meidaan.com/archive/24127>
- 8-<http://www.bbc.com/persian/iran-41460739>
- 9-<https://www.radiozamaneh.com/391482>
- 10-<http://press.jamejamonline.ir/Newspreview/2910359007244554432>
- 11-<http://www.salamatnews.com/news/157243/-/%D8%AE%D9%88%D8%AF%D8%B3%D9%88%D8%B2%D9%8A-%D8%AF%D8%B1-%D8%A7%D9%8A%D9%84%D8%A7%D9%85-%D8%B1%D8%AA%D8%A8%D9%87-%D8%A7%D9%88%D9%84-%D8%B1%D8%A7-%D8%AF%D8%B1-%D9%83%D9%84-%D8%AF%D9%86%D9%8A%D8%A7-%D8%AF%D8%A7%D8%B1%D8%AF>

13-<http://otaghiranonline.ir/news2/9052>

Hevpeyvînek digel Agirî Îsma`îlnijad çalakê siyasî derheq kirîza avê di herêmê de



Agirî
Îsma`îlnijad:

“Kirîza te, ji min
re derfet e”



H: Cemal resûl Dinxê

Di demekê de ku Rojhilata Navîn pîrr e ji bûyerên ku nahêne pêşbînîkirin, kêşeyeke din serî hildaye ku ew jî kêşeya kênavî û bêaviyê ye. Kurdistan mezîna di vî warî de xwediyê nêzik bi %75 a ava şîrîn a navçeya Rojhilata Navîn e, lewra çar dewletên dagîrker siyasî û pêngavên cûrbicûr di Kurdistanê de girtine pêş.

Derheq vê kêşeya cidî de, malpera Kurdistanmedia hevpeyvînek digel Agirî Îsma`îlnijad çalakê siyasî pêk aniye, ku emê bala we bo xwendina vê hevpeyvînê radikêşin.

Pirsyar: Kêşeya bêavi û çareserkirina vê kêşeyê di navçeyeke kênav de, çi pêşerojekê bo xelkê çê dike?

Bersiv: Di navçeya Rojhilata Navîn de av kênav e, ew kêmbûn mijareke taybet bi niha niye, û jîngeha vê navçeyê bi vîawayî ye, û niha bi sedema şer, têkçûna rewşa hewa, zêdebûna rêjeya cemawer, vegeşîna nearamiyê û birêveberiya lawaz ya avê, kirîza avê û piştî wê jî kirîza jîngehê zêde bûye, û ji caran kûrtir bûye.

Destpêkê dibe ku bêjim ku çima av girîng e, di van welatan de ku hînerê enirjiyê ne, enirjî wekî bingehekê bona vegeşîn û wekî bingehekê bo aboriyê û wekî bingehekê bo jiyanî rojane ya civaka wan lê tê nihêrin, di navçeya me de jî ku av bi rêjeyeke dilxwaz bo hilpehilpa birêveber û siyasîvanan nine, ku wisa bû av bingeha jiyanî civaka Rojhilata Nvîn e, û ew yek jî tê wê watayê, ku av û jîngeh di Rojhilata Navîn de pîorseke siyasî-tenahî ye, û nahê kirin ku tenê wekî pîorseke jîngehî lê bihê nihêrin, jiber ku rêjeya avê bo jiyanî rojane û bona vegeşîna aboriya civaka Rojhilata Navîn rêjeyeke kênav

e, û li gora hewcehiyê nine. Ku wisa bû kirîza avê wate hejarî, nexweşî, şer, nearamî û derbiderî, û kurt û Kirmancî wate kirîz di hemû beşên jiyanî civakî û takekesî de.

Pirs: Gelo hûn siyaseta çar dewletên dagîrker bo Kurdistanê derheq bêavi û çareserkirina avê çawa dibînin ?

Bersiv: Pîrsa kênaviyê di hemû Rojhilata Navîn d eheye. Kurdistan hekî em bas ji her çar perçeyên wê bikin, tenê navçeyeke Rojhilata Navîn e, ku kirîza wê ya kênaviyê tune ye, û nêzî %75 a ava şîrîn ya navçeya Rojhilata Navîn ji wir ve çavkanî digre. Ku wis abû di warê teorî de, hekî Kurdistan tenê xwe be, wekî coxrafiya me di Kurdistanê de û niha kirîza bêaviyê tune ye, lê kênavî heye, lê me kirîz tune ye.

Lê pîrsa jîngehê pîrsek nine ku bkare sînorê neteweyî û siyasî bo bihê diyarîkirin, û rast kêşê jî ji vir ve dets pê dike, ku welatên rojhilata Nvîn jî li gora kiryarên borî û niha ya wan tu pîrsek wekî pîrsa giştî ya navçê nahê dîtin, û ew wekî kirîzekê di navçê de bi mercekê li çarçoveya sînorî siyasî ya xwe de nedanê, wekî derfetekê box we dibînin bo mînak rejîma Îrtanê ku li mezintirîn kirîza avê de ye, ji aliyekî xwe bi qurbanî dihesibîne, li ser pîrsa avê digel Efxanstan û li hean demê de heman kiryarê ku Efxanistan dike.

Rejîma Îranê li sînorê di navbera Rojhilata Kurdistanê û Başûra Kurdistanê dubare dike, ku baweriya Îraniyan ew e ku kirîza avê, din ava Îranê de kirîzeke navxweyî ye, û her hinek pêngavên navxweyî jî çareser dibe. Di demekê de ku ne wis aye, û kêşeya avê û karvedanên vê kirîzeke navçeyî ye, û hemû herêmê digre xwe.

Rast e ku hemû welatekî navçeyê hea Tîrkiye jî hewcehiya wê bi pêngava navxweyî heye bona çareseriya vê kirîzê, lê girîngtir ji pêngavên navxweyî pêngava navçeyî ye, û rêkvektîna dualî û çend alî di navçeyê d eye, û avakirina pîlatformeke giştî ya çend alî li ser vê bingeha ku xisara vê kirîzê li navçeya Rojhilata Navîn bê kêmkirin.

Herwekî ku min bas kir, li çanda siyasî ya Rojhilata Navîn de, kirîz di erdnîgariyê siyasî de tê wateya derfet bo erdnîgariyê siyasîtir ya vê navçeyê, û hemû reftarên siyasî ên vê navçeyê jî li ser bingeha vê hizrê ye, û her wekî ku em dibînin

Sûriye mînak herî pêş çav e, ku hemû welatên rojhilata Nvîn şerê navxweyî ê Sûriyê bi derfetekê dizanin bona pêşvebirina xwazî û hêviyên navçeyî ên xwe. Îran li pey xeta Şî'e ya xwe ye, û Tîrkiye jî xewna Neo Osmanî dibîne, û Îsraîl bi derfet dizane bo diyarîkirina sînorê xwe, û Erebestan jî bi heman lojîka wan sê welatên din li kirîza şerê navxweyî ê Sûriyê dinihêre.

Di vir de dixwazi ku bêjim hekî bo pîrseke siyasî yan aborî, bikarî ku sînorê erdnîgariya siyasî diyarî û kifş bikî, û vê pîrsê li ser bingeha “Kirîza te, derfet e bo min” şirove bikî, ecêb nîne, lê bo pîrseke jîngehî û bo kirîza avê nikarî vê bingehe danî. Bo mînak di van rojan de cardin bas ji girtina bendava “Koleser ya serdestê” jî aliyê rejîma Komara Îslamî ve hatiye gorê. Dema ku ew bendav tê girtin, metirsiya bêaviyê li bajarê Qeladîzê çê dibe, û bas ji kirîza bêaviyê li Başûra Kurdistanê tê kirin, lê ew yek hemû mijar nîne, û ava bendava Koleser di dawiyê de dirêje nava Xelîcê û talawa Hûrul`ezîm de.

Hûrul`ezîm gellek kênav e, û ew yek jî bûye sedema vê ku beşeke wê hişîk be, û kêmbûna ava wir tê wê watayê,

ku yek ji girîngtirîn kangehên tozbarîna di navçeya Xûzîstanê de, rastî kênaviyê tê, û hekî tozbarîna di vê navçeyê de zêde be, eva yanî Îran bi xwe ye, ku bi girtina ava Koleser rastî kirîze dibe, û hemû kirîzên pêwendîdar bi jîngehê û avê li rojhilata Navîn bi vî awayî kirîzeke aloz û çend alî ne, û lewra jî çareseriya wan di çarçoveya sînoreke siyasî de ne tenê zehmet e, belku îmkana wê jî tune ye.

Pirs: Du rejîmên dagîrker ên Îran û Tîrkiyê hişdarî dane ku ewê avê li ser Kurdistanê Başûr de qut bikin, û niha jî Kerkûk rastî kênaviyê hatiye, pêşeroja vê biryarê wê çi encamek hebe?

Bersiv: Herwekî ku min bas kir, av kirîzeke navçeyî ye, û diyare ku başûr wek Başûra Kurdistanê, ji parçeyên din kênavtir e. Herwisa wekî bingeha jî çanda siyasî di Rojhilata Navîn de eva ye ku “kirîza te derfeta min e”. Ew yek jî wate Tîrkiye û Îran, vê bêaviya Başûr wekî derfet ji xwe re dihesibînin.

Lê ez wekî kesekî ku hem li Başûr jiya me, û hem jî min hinek şarezayî di deshilatdariya avê d eheye, min jêve ye ku kirîza avê di Başûr de jî berî her tiştî hewcehiya heye bi pêngavên navxweyî, lê çanda siyasî ya Başûr li ser bingeha herêma kesk û zer hatiye avakirin, û her basek yan kirîzek di yek ji wan herêman de, ê din wekî derfetekê ji xwe re dibîne, bona vê ku bike kartek li dijî aliyê din ê siyasî di herêmê de.

Berî her tiştî min jêve ye ku Başûriyan dibe stratejiya navxweyî bo deshilatdariya avê hebin, ew hinde bê av jî nînin, ku Tîrkiye û Îran bikarin ku li dijî wan çeka avê bi kar bînin, û vê yekê jî bizanin ku Îranê ew hêz û şîyan nine ku avê wekî çekek li dijî tu welatekî din bi kar bîne. Jiber ku Îran bixwe di kirîza herî mezin ya bêaviyê d eye, lê mixabin

Doma R: 1

eta rejîmê tenê xesaran ji bo xelkê Îran û welatên cîhanê zêdetir dike, û mecalê pêk tîne ku rejîm di herêma de bandora xwe hebe.

Hicrî di beşeke axavtina xwe de pêdagîrî kir ku xelkê Kurdistanê Îranê, û PDKÎ weke partiyeke xwedî dîrok û pêgeha cemawerî û bi ezmûna zêdetir ji 70 sal xebatê li dijî du rejîmên paşayeti û Komara Îslamî dixwaze ku xebata xwe milbimilê xebakata seranserî li Îranê li dijî komara Îslamî Îranê bihêztir bike.

-Roja Çarşemiyê 23'ê Cozerdanê, Navenda Lêkolîna Londonê li yek ji avahiyên ser bi kongireya Amerîkayê de civîneke taybetî ji bo serkirdayetiya Kurd derheq pêşeroja Îranê û rola Kurd bi rê ve bir, ku tê de lêpirsyarê giştî ê PDKÎ bi hûrî bas ji dawî rewşa Kurdistanê kir.

Di vê civînê de ku çendîn endamên kongireyê, stafêrê çendîn endamên kongireyê, lêkol-er û endamên Navenda Lêkolîna Londonê û herwisa nûnerê çend medya û dezgehên ragehandinê beşdar bûn, birêz Hicrî bas ji vê kir ku Kurd li Kurdistanê Îranê de li jêr zext û givaşê zêde ji qas de ye, û hewcehî bi vê heye ku bête alîkarîkirin, bona vê ku bikare li hemberî rejîna hov ya

Komara Îslamî de bisekine. Bas ji vê jî kir ku rejîma Komara Îslamî ne tenê kêşe ye bo xelkê welatê Îranê, belku serêşeyeke serekî ye jî bo tewahiya navçê, û hewce ye piştgirî ji xelkê Îranê û bi taybetî Kurdan bê kirin, da ku bikarin vê rejîmê biguherin, û di hember de jî bisekinin, ku eva dibe sedema vê ku aştî di hemû navçe û cîhanê de cihgir be. -Roja Sêşemî 12'ê Hezîranê "Mistefa Hicrî" lêpirsyarê giştî yê PDKÎ di "Navenda Hadson" a Amerîkayê de gotarek pêşkêş kir, û li wir derheqê dawîn guherînkariyên dever, Îran û Kurdistanê de axivî.

"Mistefa Hicrî" di axavtinê xwe debas ji vê kir ku, baştirîn rê ji bo bidawîanîna bi kiryar û reftarên dîktatorane yên Komara Îslamî a Îranê di navxweyî welat û destêverdanên vê rejîmê li derveyî sînoran de, alîkarîkirina digel xelkê Îran û piştevanîkirina ji xebata çekdarane ya gelê Kurd e.

-Roja Sêşemî 29'ê Cozerdanê (19'ê Hezîranê) jî "Mistefa Hicrî" lêpirsyarê giştî yê PDKÎ di civîneke rojnamevanîyê de ku di Enstîtûya Kurdî ya di "Washington"ê de bi re ve çû, beşdarî kir, û tê de hejmarek roj-namevan û dezgehên medyayî yên biyanî û Amerîkayî jî amade bûn.

Di vê civînê de nûçegihanê "Ferance Press" jê pirs kir ku, me dît

digel Kurdistanê Germen hebe.

Pirs: Boçûna we li ser pirsê avê û siyaseta di navçeyê de çi ye?

Bersiv: Hekî aliyên siyasî ên Kurdistanê bi hûrî stratejiya niştimanî bo kirîza avê diyarî nekin, bi sedema vê ku navçeya me tenê navçeya xwedî av a Rojhilata Navîn e, ku dikarî ava wê bo navçeyên din bi awyaê destçêkirî

veguhêzî, bêguman di pêşerojê de Kurdistan bi giştî û Kurdistanê Rojhilata bi taybetî di encama kirîza avê de ratsî kirîz û arîşeyeke gellek mezin ya civakî, aborî, siyasî û çandî tê. Lê mixabin ne aliyên siyasî û ne jî şarezayên Rojhilata hest bi girîngiya kirîza ava Rojhilata Nvaîn nekirine, û lewra jî wekî pirsê rewşenbîrî dibînin!!!.

Amerîkayê di Îraq û Sûriyê de Kurd ji bo şerê li dijî DAÎŞ'ê bi kar anîn, lê mixabin di dawiyê de jî îxanet li Kurdan kir, û piştî Kurdan vala kir. Hûn

çi garantiyekê dibînin ku Amerîka wekî emrazekê mifahê ji we wer-negire, û di nîva rê de digel Îranê rêk bikeve, û piştî we vala bike? Mistefa Hicrî di bersiva vê pirsê de got ku: "Me xebata xwe ya li dijî Komara Îslamî gellek pêş ve ku mijarên wiha bêne rojevê, me dest pê kiriye, û berdewam jî dibin. Herwisa Amerîka çi hebe, û çi jî nebe, emê wê xebata xwe bidomînin, û dest ji xwastek û daxwaziyeke xwe û riya xwe bernadin, û ew hêza ku piştî me ye, tenê û tenê xelkê me bixwe ye, ne yek peyv zêde, ne jî yek peyv kêmtir".

Malpera naskirî ya "Al-Monitor" jî raporek derheqê dawî çalakîyên dîplomatîk ên PDKÎ li derveyî welat, û çalakîyên leşkerî ên Pêşmergeyan di navxweyî welat de belav kiriye, ku tê de awirek li çalakîyên Hêza Pêşmerge Kurd-istanê û hevdîtîna birîz Mistefa Hicrî hatiye dan.

Di beşeke vê raporê de hatiye:



Hêzên opozisyona Kurdistanê Îranê hêvîdar in ku hekî Amerîka bixwaze bi awayekî micid ber-birûyê rejîma Tehranê bibe, ew bibin beşeke serekî ji siyaseta guherîna rejîmê ku siyaseta nû ya koşka Spî ye.

Di beşeke din de hatiye ku: Rêberê PDKÎ serdana Waşingtonê de kiriye, û tê de bas ji rewşa navxweyî ya Îranê, û pêşeroja Kurdistanê digel karbidestên îdareya Trump û kongirêsmen û tînkîtanê Amerîkayê kiriye. Herwisa tê de îşare bi vê hatiye kirin, ku girîngiya vê hevdîtîna rêberatiya Kurd di vê de bûye ku berevajiyê hevdîtîna pêşîn sîgnaleke nû û cidîtir bo guherîna rejîma Îranê heye.

Di beşeke din ya raporê de îşare bi cudahiya gotara vê carê ya vî rêberê Kurd hatiye kirin, ku tê de komeke pirsên siyasî ên girîng û yek ji wan rola PDKÎ li ser pêşeroja Kurdistan û Îranê digel karbidestên hatiye kirin.

Doma gotara R: 5

rewşa siyasî ya navxwe ya başûr ew derfet bo Îran û Tirkîyê diafirîne. Ez naxwazim herim ser hûrdekariyên kirîza ava başûr, lê bi tewahî baweriya min heye ku kirîza avê din vê navçeyê de jî, berî vê ku pêwîstî bi pêjgavhilgirtina bo aliyê Tirkîyê û Îranê hebe, hewcehî bi destnîşankirina stratejiya navxweyî ye.

Pirs: Helwesta berpirsên Herêma Kurdistanê dibe ku derheq biryara Tirkîyê û Îranê çi dibe?

Bersiv: Di siyaseta navdewletî de, nêzîk bi 420 rêkvevtinên cîhanî û herêma li ser pirsê avê hene, Herêma Kurdistanê dikare ku li ser bingeha wan ezmûnên ku di cîhanê de heye, digel Îran û Tirkîyê li hev bike, lê êşkere ye ku hemû rêkvevtineke navdewletî li ser bingeha hêzê tê girêdan, heta hekî ew lihevkinin li ser kirîzeke girîng wekî av û jîngehê jî be, bi taybetî dema ku biryare rêkvevtin di navbera Îran û Tirkîyê



Nerîna Lîderan



Mistefa Hicrî:

“Em dixwazin ku Amerîka piştigirîya xelkê Îran û Kurdistanê bike ku bi-karin rejîmê biguherin”.



Demîrtaş:

“20 salên din jî di girtîgehê de bim, ez serî natewînim.”.



Ehmed Tirk

“Di girtîgeha Amedê de bi darên xwedê û pêxemberan li me dixistin.”.



Netanyahu:

“Rejîma Îranê dibe ji xaka Sûriyê vekêşe, û Îsraîl li dijî wan hêzan bédeng nabe”.

Lêpirsyarê giştî yê PDKÎ çalakiyên dîplomaşî yên xwe didomîne



Di doma sefera dîplomatîk ya Lêpirsyarê giştî yê PDKÎ de, civîneke rojnamevanî ya taybet jî bo navbirî hatibe lidarxistin.

Li gorî nûçeya ku gihaye malpera “Kurdistanmedia”yê, roja Sêşemî 29’ê Cozerdanê (19’ê Hezîranê) “Mistefa Hicrî” lêpirsyarê giştî yê PDKÎ di civîneke rojnamevanîyê de ku di Enstîtûya Kurdî ya di “Washington”ê de bi re ve çû, beşdarî kir, û tê de hejmarek rojnamevan û dezgehên medyayî yên biyanî û Amerîkayî jî amade bûn.

Di destpêka civînê de, “Mistefa Hicrî” komek bas û babetên pêwendîdar bi Kurdistanê anîne ber bas, û piştê jî rojnamevan û medyakaran pirsên xwe ji lêpirsyarê giştî yê PDKÎ kirin, û ji aliyê navbirî ve bersiva van pirsan hate dan.

Lêpirsyarê giştî yê PDKÎ di destpêka axavtina xwe de îşare bi rewşa aloz ya jiyanê di Îranê de, bi taybet di warê aborî de kir, û ragehand ku, ev rewşa rojbiroj aloztir dibe, û herwiha bas ji vî kir ku givaşên rejîmê bo ser xelkê zêdetir bûye û îdamkirin, serkutkirin û givaşên rejîmê gihîştîye asta herî serê, û xelkê Îranê niha li ser vî baweriyê ne ku ev rejîma hilgerê reformê nine û nikare çaksaziyê di nav xwe de pêk bîne. Piştê di bersiva vî pirsê de, ku armanca serfêra we bo Amerîkayê çîye, û hûn dixwazin çî peyamekê bidin Amerîkayîyan?

Mistefa Hicrî di bersivê de got ku:

“Em dixwazin ji Amerîkayîyan re bêjin ku hûn çî bixwazin, û çî jî nexwazin, xelkê Îranê gav ji bo guherîn û herifandina rejîmê hilgirtine; Xwenîşandan, û girevgirtinên curbicur zêdetir dibin, û silogan û daxwaziyan xelkê zêdetir ji bo herifandina rejîma ne; û bas ji vî yekê jî kir ku em naxwazin Amerîka biçe rejîmê ji bo me biherifîne, yan jî biguhere, û êrîşî ser wê bike, belku daxwazkariya me ew e ku Amerîka ev şaşitiyan ku di Sûriyê de encamp dan, van şaşitiyan di Îranê de ducarî neke.

Di vî derheqê de jî got ku, beşdarnebûna Amerîka û Rojava di Sûriyê de wisa lê kir ku Sûriye bibe cihekî baş ji bo çalakiyên rejîma Tehran û hêzên terorîstî, û di dawiyê de jî Sûriye ber bi vî aliyê ve biçe ku niha hûn dibînin; Her bi vî sebebê ye jî hekî welatên Demokratîk di vî demê de di guherînkariyên Îranê de beşdar nebin, renga riya guherînê di Îranê de biguhere, û li jêr kontrola hêzên demokratîk de derkeve.

Piştê nûçegihanê “Ferance Press” jî pirs kir ku me dît Amerîkayê di Îraq û Sûriyê de Kurd ji bo şerê lidijî DAÎŞ’ê bi kar anî, lê mixabin di dawiyê de jî îxanet li Kurdan kir, û piştê Kurdan vala kir. Hûn çî garantiyekê dibînin ku Amerîka wekî emrazekê mifahê ji we wernegire, û di nîva rê de digel Îranê rêk bikeve, û

piştê we vala bike? “Mistefa Hicrî” di bersiva vî pirsê de got ku: Me xebata xwe ya li dijî Komara Îslamî gellek pêş ve ku mijarên wiha bêne rojevê, me dest pê kiriye, û berdwam jî dibin; Çi Amerîka hebe û çî jî Amerîka nebe emê wê xebata xwe bidomînin, û ji dest ji xwastek û daxwaziyan xwe û riya xwe bernadin, û ev hêza ku piştê me ye tenê û tenê xelkê me bixwe ye, ne yek peyv zêde, ne jî yek peyv kêmtir.

Eva ku em li wir dixwazin encam bidin eva ye ku, faktorên navneteweyî digel xwe bikin yek, bi awayekî ku bandora me li ser van hebe, û bi qazanca me hereket bikin, hekî ne, em tu demî di çarçoveya xebata xwe de pişt bi Amerîkayê girê nadin, û got jî ku em weke hêzekê çav li Amerîkayê dikin ku em di nîrx û buhayên giştî de digel yektir hevpar in, her bi vî sedemê ye jî ku dibe riya me yek be”.

Herwiha di hevdişîyên din ya xwe de “Mistefa Hicrî” di Navenda Rojhilata Navîn ya di “Washington”ê de bas ji dawîn guherînkariyên Kurdistan û Îranê kir û got ku:

“Ewa gellek girînge ku şeweya di-tingeha me derheqê Kurdistan û Îranê de, li wir dengvedanek hebe, çimku dibe alîkar ji bo têgihîştina naveden cûrbicûr, tînktenkan û siyasetên Amerîkayê yên lihemberî Kurdistan û Îranê û Rojhilata Navîn de.

Rikeberê serekî yê Erdoxan, daketina buhaya Lîreyê Tirkîyê ye

Karnasên siyasî ser vê baweriyê ne ku rikeberê herî metirsîdar û bihêz ê Erdoxan di hîlbijartinên serkomariyê de buhaya Dolar, û daketina buhayê Lîreyê Tirkîyê ye.

Di vê derheqê de malpera “The Wall Street Journal” di şiroveyekê de nivîsandiye: “Erdoxan ku kariye rewşa aboriya Tirkîyê baş bike, niha rikeberê wî ê serekî û girîng Dolar û daketina buhayê Lîreyê Tirkîyê ye”. “Yaroslav Trofimov” karnasê pirêsn Rojhilata Navîn û kunciknivîsê malpera “The Wall Street Journal”ê nivîsandiye: “Ji sala 2003’an şûnda Erdoxan bi serberedayîtiyê (îstîbadê) deshilatdarî kiriye. Wî di siyaseta xwe ya dervayî de kesekî demdemî bûye, û di navxwe de jî gellek kesên derdora wî, dosiyeyên destpîsiya malî hene. Lê serbarê vê yekê jî Erdoxan kariye ku dangan bi dest bîne, û sedem jî pêşkevîna biyavê aborî bûye”. Li gora serjimêriyên Banka Nav-



endî, dahata serane ya Tirkîyê ji sala 2003’an şûnda heya niha %70 zêde bûye, lê niha êdî aboriya Tirkîyê ku bi tewahî girêdayî sermadanîna derekî ye, ketiye nava qonaxeke bizemmet de.

Di van hefteyên dawiyê de perê Tirkîyê jî nişkêva daket. Yek ji sedemên vê daketinê jî ew bû ku tirsê vê hindê heye ku Erdoxan serxwebûna Banka Navendî berteng bike.

Lê di hember de AKP radigehîne ku

daketina buhaya diravê wan di hemberî Dolar de pîlana derekî ye, û bihanî dixwazin bi vê pîlana pêşiya cîbicikîna pirojeya Tirkîyê bigrin ku dixwaze bibe mezinhêzeka cîhanî û rêbertiya cîhana Îslamê bike.

Rast îdî`a û gotinek ku em bi sala ye ji devê rayedarên rejîma Îranê jî dibihîzin ku xwe li hemberî kêşeyên navxweyî de bêguneh nişan didin, û guneh û tawana kêşeyên navxweyî dixin stûyê deshilat û hikûmetên din ên cîhanê.

Malpera “The Wall Street Journal” dinivîse ku Erdoxan niha êdî hez-kirina wî di nava xelkê Tirkîyê de li çav caran kêmîr bûye. Ew rewşa nebaş ya niha ya aborî û daketina buhaya Lîreyê Tirkîyê, bûye hêcetek baş di destên opozisyona çend ker (çend tike) ya Tirkîyê de, da ku hesabî siwarî pêla vê lawaziya dewletê be, û tevna (tane û niçika, tane û teşera) li serkomar bide.

Her di vê derheqê de “Muherem Înce” rikeberê serekî ê Erdoxan bo posta serkomariyê dibêje: “Gendelî û destpîsiya malî, waswasîbûn, û dîtingeh aîdeolojîk, tevlihevî û bêserûberiya serxwebûna navendên aborî, û nemana zelaltiyê (şefafiyetê) ji wan sedeman in ku aboriya welat dixin nava reşçaleke gellek tarî de”.

Derheq rewşa aboriay Tirkîyê karnasê pirsên Tirkîyê “Suner Cakaptay” ragehandiye: “Em di qonaxên destpêkê yê rewşa pirr ji kirîz ya aboriya welat de ne, û hêla gellek aliyên hest bi vê nekirine ku aboriya Tirkîyê rastî kêşe û arîşeyan hatiye, lê daketina aboriyê, wê hêdî-hêdî bandora xwe li ser xelkê wê danê”.

Raporeke meydanî li ser rewşa jiyanê li Urmîyê

Rewşa jiyanê li bajarê Urmîyê her roj bizemmetir dibe, û hewlên rejîma Îranê bona guherîna demografiya vî bajarî û herwisa zêdekirina rêjeya ajanan di vê navçeyê de zêdetir dibe.

Li gora raporeke meydanî ku li bajarê Urmîyê de hatiye encamdan, rejîm cûda ji zulma eşkere ya neteweyî û dînî bi zalkirina rewşa polîsî bi taybetî di navçeyên sînorî û herwisa hebûna gendeliya îdarî ya bêqas, rewşa jiyanê li bajarê Urmîyê û derdorê bo neteweya Kurd di vê navçeyê de gellek bizemmet bûye.

Li gora raporên belavbûyî, belavkirina azadane ya madeyên sîrker bi taybetî Rewangerdanên pişeyî di nava xwendekar û dersxwanan de bûye sedema nîgeraniyêke giştî di nava vî bajarî de, ew yek jî hevde me digel zalkirina rewşa polîsî bi ser zanko û xwendingehan de, û hewla organên bednav ên wekî besîc bona handana lawan bi armanca encamdana karê ajantiyê.

Nûçegihaniya “Kurdistanmedia”yê di doma raporê de îşare bi vê dike ku piştî meşên meha Befranbara sala borî

rêjeyeke berçav ji beşdaran hatin girtin, ku hêla jî beşek ji wan di girtingehan de ne, ew yek jî tenê li ber vê ye ku ew amade nebûn, hevkarîya rejîmê û dezgehên serkutker bikin.

Li gora gotina navbirî çûne derve ya yekalî ya Amerîkayê ji Bercamê, rewşa aboriya hevşêwe ya bajarên din ên Îranê, ber bi paşve vegehiyaye, û giranî û tewerom (helawsan, enfilan-siyon) bêkarî û bêbazarî bi xwe ve dîtîye.

Ji aliyekî din ve jî rewşa gola Urmîyê ku niha wekî girîngtirîn kirîza jîngehî ya Îranê tê hesabê, her wekî xwe maye, û rejîm ne tenê li hemberî qedera wê de xwe bi berpirsyar nizane, belku li parêzgehên wekî Tewrêzê bo hênikkirina karxaneyanê navdewletî jî wê kême ava ku dirêje nava behrê de, mifayê werdigre, û bi dizîna ava navçeyên Kurdistanî wekî Soma Biradost û Şipîranê bo navçeyên çandiniyê ên wekî Qerebax û Necefabad, li derodra bajarê Tesûcê, wan navçeyan pê têrav dike.

Wergirtina axazadeyan, hiqûqên bêreje, gendeliya îdarî bi taybetî li şaredariya Urmîyê, vegeşîna diyardeyên wekî xwezokî, leşfiroşî, zarokên kar, beşeke din ji van kêşeyan in ku rojane têne dîtin.



Herwekî ku di derbazbûyî de jî rû daye, reîm bi armanca guherîna demografiya navçeyê û hewla asîmîlekirina navçeyê, niha jî berdewam e li ser guherîna navê şeqam û bajarên Kurdistanê bi Turkî, û berdewam ev welatîyên Azerî han didin, bona sazkirina tevdanî û tîkderî û netebahiyan.

Li gora gotina vî nûçegihanê “Kurdistanmedia”yê, Rasan û tevgera nû ya PDKÎ xelk hêvîdar kiriye, û serbarê hemû rewşa bizemmet ya jiyanê, di rûniştinên xwe de bas ji piştgirî û piştevaniya ji pêşmergeyên PDKÎ dikin. Di dawîya raporê de jî nûçegihanê “Kurdistanmedia”yê nivîsandiye: “Rejîmê di çend salên borî de hewl daye, ku ji riya mohreyên xwe, bi taybetî xwefiroşan ve, sîstema erbab û re`iyetiye zindî bike, û hewl bide bona bihêzkirina sîstema eşîretiyê, û bi çekdarkirina hinek kesên nefsnîzm (ku navên wan li cem me parastî ye), hewla nifûza zêdetir di vê navçeyê de didin.

Rejîma Îranê çî dilxweşiyek ji xelkê re nehêlaye

Îran yek ji wan 10 welatên yekem ên cîhanê ye di warê xemokiyê de, û sedem jî ew e ku rejîma Îranê çî dilxweşiyek ji xelkê re nehêlaye.

Nûçegihaniya “ISNA”yê di raporekê de li jêr navê dilxweşiyên qedexekirî di Îranê de, ew mijara şirove kiriye, ku çawa gellek ji rûdawên çandî, civakî, û siyasî di Îran de bi bêy ve ku qedexeya yasayî li ser hebe, tenê bi amadeyiya girûpên zext û givaşê, û bi selîqeya hinek aliyan di nav deshilat-dariyê de, xeta qedexebûnê bi ser de tê kêşan.

Di şopandina sedem û reh û rîşeya vê rewşa metirsîdar ya civakê de gellek sedem xûya dikin. Sedemên aborî wekî hejarî û bêkarî, û arîşeyên malbatî û civakî û hebûna qedexeyan li ser geriyan û bêhnvedan û sergermiyên ku bêhna kelecana û kêfxweşiyên jê tê. Bo mînak, derheq çûna jinan bo stadyoman, dewlet û hin feraksiyonên meclisê razî bûn bi vê yekê, lê hinek beşên îcrayî (birêveberî) dijî vê yekê helwest girtin, û heta serkomar jî nekarî çî tiştî bo çûna jinan bo nav stadyoman bike.

Fîlterkirina Telegramê û qedexeya

li ser belavokan û nîşandana filman û pêkanîna astengiyan li ser riya kesayetiyên çandî, sedemek din ji standina dilxweşiyên ji xelkê ye. Hemû ew astengî jî bona pêşgirtin ji nivşa genc û ciwan e, ku dixwaze riyekê ji bo jiyana baştir û parastina çirûskên hêviyê di singê xwe de peyda bike. Nûçegihaniya “ISNA”yê di doma vê raporê de dinivîse:

“Pêdeçûnek bi ser van qedexeyan de, nîşan dide ku li hemberî jidestçûna baweriyê û dilgermiyên beşeke civakê, tiştêkî wisa nebûye para qedexekaran, û hekî ew qedexeya li ser van pirsên sade nebûya jî, tiştêke ecêb nediqewimî”.

Piştî di vê raporê de bas ji qedexeya li ser leyîstina genc û lawên welat bi avê, û duçerxesiwarîya jinan, û qedexeya du’aya “Rebbena”ya Şerçeriyana û qedexeya muzîkê û merasima Valintaynê kiriye.

Bo mînak derheq qedexeya li ser

“Rebbena” a Şerçeriyana dinivîse:

“Derheqê du’aya “Rebbena” ya Şerçeriyana serbarê ve ku Wezîrê Çandê nameyek ji serokê Saziya Deng û Reng re nivîsand ku dibe ew du’a di ragehandinên Îranê de belav bibe, lê nameya wî bêbersiv ma. Lê Mihemed Cewad Larîcanî ku endamê Konseya çavdêriya bi ser Saziya Deng û Reng e, nivîsand: “Jiber ku mijara berevanî ji Şerçeriyana bûye behs û gengeşeyêke siyasî, lewra di dema xwendina vê du’ayê de, bala xelkê diçe ser mijareke din, û ew du’a dikeve bin bandora vê gengeşeyê de, û ew yek li dijî pîrensîpên şer’î ên xwendina du’ayê ne”.

Ew rapor bas ji roja Valintaynê jî bi vî rengî dike:

Roja Çarşemiyê 21’ê Rêbendana 1394’an bexşnameyêke Îdareya Emankin a “NACA”yê derheq merasima Valintaynê belav bû ku tê de hatibû: “Yekîtiyên pîşeyî bi tu awayî ew heq nînin ku li ser kelûpelên xwe nîşana Valintaynê danên, û nabe jî keç û kur li çî ciyan kom bin û diyariyên derheq vî rojê bidin hevdu!”.

Ew rapor bas ji rewşa muzîkê jî di ragehandinên rejîmê de dike, û dinivîse ku: Serbarê nebûna tu bexşnameyêke fermî ji aliyê Saziya Deng û Reng ve, nîşandana saz alavên muzîkê qedexe li ser e, û eva jî vedigere ser boçûna nelojîk a Xamineyî û hin boçûnên din ên fiqhî. Di Meşhedê de jî bi sala ye ku konserta muzîkê qedexe ye, û “Elem El-huda” pêşnimêjê Meşhedê ragehandiye ku konserta muzîkê “mu-tribbazi” (mirtiwî)ye, û nabe li nêzî herema Îmam Riza konsertên muzîkê bi rê ve herin.

Bi vî awayî ye ku rejîm çî mecal û derfetekê nade xelkê welat ku dilxweş bin, û di encam de em dibînin ku Îran di warê asta xemokiya xelkê welat de, dikeve nav rîza 10 welatên yekem ên cîhanê di warê xemokiyê de.

%83 ji kedkarên Îranê di bin xeta mirinê de ne

Nûnerê kedkaran di Şêvra Bilind ya Kar de ragehand ku %83 ji kedkaran di bin xeta merg û mirinê de dijîn.

Di sê mehên derbazbûyî de nirxa her tiştî di Îranê de ew qas giran bûye, ku kêmasî heye û rewşê rexne neke, û gilî û gazinde tunebin, lê di vê navberê de kedkar zêdetir ji her texeke din, di bin barê giraniyê de dinalînin.

Feramerz Tofîqî Nûnerê kedkaran di Şêvra Bilind ya Kar de jî derheq

rewşa kedkaran nîgeraniya xwe eşkere kiriye, û ragehandiye ku %83 ji kedkaran li jêr xeta merg û mirinê de dijîn.

Navbirî herwisa ragehandiye ku tu dewletekê heta niha pîlan û terh ji bo baştirkirina rewşa kedkaran û zêdekirina heqdestê wan tunebûye, û dibe her çawa ku di dema piropagendeyên hilbijartinan de qewl û sozan didin xelkê ku kêşeyên wan çareser bikin, di kiryarê de, jî van qewlên xwe bi cih bînin, û nabe em hemû giraniyekê jî bixin stûyê Amerîkayê û vekîşiyana

wî welatî ji Bercamê.

Feramerz Tofîqî Nûnerê kedkaran di Şêvra Bilind ya Kar de derheq giranbûna nirxa goşt û birinc û rûn de jî ragehandiye: “Giranbûna %40 a nirxa mirîşkê, %30 ya goşt, %18 ya birinc, û %28 a avahiyan û... hwd, nîşan dide ku berpirsên kargêrên welat xelk bi tenê hêlane”.

Navbirî derheq heqdestê kedkaran got: “Qewlê zêdekirina heqdestê kedkaran wekî cemedî li ber germê bû. Yanî dewletê xwe bêdeng kiriye, û hinek berpirs jî hêcetan bo vê reşwa

xirab tînin”. Wî derheq piştevaniya ji kelûpelên navxweyî jî got: “Heta dema ku kursiyên mezin yên aborî wekî (heyeta dewletê, odeya bazer-

ganî, odeya pîşesazî û me’idenê) yên sermayedar û xwediyan bongahên aborî bin, em nikarin kêşeyan çareser bikin”.

Nûnerêkî meclisa rejîma Îranê: Em bixwe qaçaçî ne

Nûnerêkî meclisa rejîma Îslamî a Îranê, bas ji vê kiriye ku, navendên desthilatdar yên rejîmê, bixwe aboriya Îranê wiha lê kirine.

Li gora raporên belavbûyî, “Cehanbexş Muhîbînya” bi nav nûnerê bajarên weke “Miyandoav”, “Sayîn Qela” û “Tikab”ê di civîneke fermî ya meclisa rejîma Îslamî a Îranê de, bas ji vê kiriye ku naven-

dên desthilatdar yên rejîmê bixwe, aboriya welat wisa lê kirine.

Vî nûnerê meclisa rejîmê bi bê ve ku navê saziya Spaha terorîstî a Pasdaran yan navendên din yên girêdayî rejîmê bîne, ji nûnerên meclisa rejîmê daxwaz kir ku, “Ji xevê rabin” û bi cihê “lîstina di meclisê de”, çavkaniyên serekî yên qaçaçî di Îranê de bibînin.

Navbirî bas ji vê jî kiriye ku naven-dên desthilatdar bi hinceta cîbicîkirina wezîfeya xwe, aboriya Îranê gihandine vê rojê.

Serokê firaksiyona xebata li dijî digel gendeliyên aborî yên meclisa rejîma Îranê bas ji vê jî kiriye ku, tiştên qaçaçî bi rengên fermî û yasayî ji aliyê qaçaçîyan ve tînine nav Îranê.

Salane bi buhaya 27 milyar “Dollar”î tiştên qaçaçî tînin nav Îranê, û Wezîrê Aborî yê Îranê jî ragehandiye ku, %70 tiştên qaçaçî yên Îranê ji sînorên nefermî ve tînin nav Îranê.

Her di vê derheqê de, “Mes’ûd Kerbasîyan” Wezîrê Karûbarên Aborî yê rejîmê, di kêleka hevdiya digel sekreterê giştî yê saziyên cîhanî yên gumrikê de gotiye ku: “Di sînorên Îranê de bi awayên fermî tu tiştên qaçaçî nayêne bo nav Îranê”.

Hunermendê Kurd Selah Osê koça dawî kir


Roja pêncşemî 7ê Hezîrana 2018, hunermendê Kurd ê Rojavayê Kurdistanê, Selah Osê, di temenê 63 saliyê de, li bajarê Qamişlo koça dawî kir.

Li gorî kesên nêzîkî hunermendê koçkirî, îro cenezayê wî ji Qamişlo bo gundê wî, Til Şîrê tê veguhestin û li wir bi xakê tê sipartin.

Hunermend Selah Osê ji dehên salan ve yek ji rûyên hunerî yên naskirî bû li bajarê Qamişlo û Rojavayê

Kurdistanê û heta niha çend albûm belav kiribûn. Selah Osê weke hunermendekî pabendî doza neteweyî ya Kurd dihat naskirin û di riya komên hunerî re xizmeta huner û folklorê kurdî kiribû.

Hunerend Osê sala 1955an li gundê Til Şîrê yê ser bi Tirbespiyê ve ji dayik bûbû û ji sala 1979an ve dest bi karê hunerî kiribû. Tevî ku zêdetirî 10 caran seredana Ewropayê kiribû û konsêrt li dar xistibûn, lê riya bû ku her li Qamişlo bimîne. Bi sedema nexweşiyê giran, Selah Osê 7ê hezîranê koça dawî kir.



Xelata baştirîn derhînerê festîval “Bîg Bing” ya Yûnanê bi derhînerê Kurd hate dan

Ajansa Kurdpa: Xelata baştirîn derhînerê festîval “Bîg Bing” ya Yûnanê bi derhînerê Kurd yê xelkê bajarê Merîwanê hate dan.

Li gora nûçeya gihaye Ajansa “Kurdpa”yê, “Perwîz Rostemî” derhînerê Kurd yê xelkê bajarê Merîwanê, xelata baştirîn derhînerê festîvala “Bîg Bing” ya Yûnanê ji ber çêkirina filma “Metersegha hem mîmîrend” wergirt.

Di vê festîvalê de, 40 kurte film digel yektir rikeberî dikirin, ku di encamê de 11 kurte film hatne hilbijartin.

Kurte filma “Metersegha hem mîmîrend” di 70 sînemayên welatê Yûnanê de wê bê weşandin, û dahata wê jî wê ji kesên ku ev kurte film çêkirine, bê dan.

Rostemî derheqê vê filmê de, ji medyayan re gotiye ku: “Senaryoya vê filmê li ser mijareke rast hatiye çêkirin ku, di şahiyekê de ji ber bombebaranê bûk û zava jiyana xwe ji dest didin, û ew merasîma davetê bi vê bûyera giran û dilêş û bireweriya tall ji bo bav û dayîkên bûk û zava diguhere”.



Navenda Kurdistannasî çîrokên folklorî yên Kurdî kom dike

Navenda Kurdistannasî ya Zanîngeha Sine çîrok û hikayetên folklorî yên Kurdî kom dike.

Navenda Kurdistannasî ya Zanîngeha Sine di çarçoveya çalakîyên xwe yên kultûrî û edebî de, çîrok û hikayetên folklorî yên Kurdî berhev dike. Navenda Kurdistannasî ji bo vê mebestê bi beyannameyekê bang li hemû hezkiriyên edebiyat û kulturê dike ku di projeya komkirina çîrok û hikayetên folklorî û civakî de alîkariya wan bikin.

Cîbicîkarê projeyê Hêriş Şêzad, da zanîn ku bi komkirina çîrokên folklorî dikarin di warên zimannasî, dîroka folklorê, edebiyata Kurdî û edebiyata çîroknivîsiyê de zanyariyên baş bidin hezkiriyên edebiyatê.

Hêriş Şêzad got: “Proje bi sê qonaxan tê cîbicîh kirin. Qonaxa yekem parêzgeha Sine, qonaxa duyem parêzgehên Îlam, Kirmaşan û qonaxa sêyem jî navçeya Muqriyan li xwe digire.” Li gor Hêriş Şêzad, proje çîrokên civakî yên hemû navçeyên Kurdişîn ên



Îranê wek Xorasan, Zahîdanim Şîraz û heta dawî li xwe digire. Di qonaxa yekem de heta niha çîrokên navçeyên Merîwan û Leylac di 6 berg û 2800 rûpel de hatine amadekirin.

Şêzad herwiha ragihand ku di vê projeyê de Zanîngeha Göttingen a Almanyayê jî hevkarîya Zanîngeha Sine dike

Zimanê Kurdî

Cînavên kesîn

Cînav Di Zimanê Kurdî De (Kurmanciya Jorîn)

*Zimanê te nasnameya te ye . Hebûna te ya neteweyî bi hebûna zimanê te ye.

*Zimanê xwe ji toz û zingara rojgarên dûdirêj dawêşîne , wî pak û petî bike ...vejîne!

*Zimanê xwe yê bertalan bi xwe biparêze û xweji bi zimanê xwe biparêze...zimanê te hebûna te ye!!

Destpêk[biguherîne]

Gelek aloziyên zimanê kurdî hêj nehatine çareser kirin . Babeta zarave (têrm) jî arîşeyeke aloz e, ku heta nuho raweya xwe ya yekbûyî negirtiye . Navlêkirina mijara (pronom) weku zarave bi gelek navan hatiye destnîşankirin . Her şarezayekî zimanê kurdî, li gora baweriya xwe bi navekî ew daye nasîn: - Mîr Celadet Bedirxan û Dr. Kamîran Bedirxan peyva (pronom) bikar aniye . - Seyda Reşîdê Kurd navê (bernav) lê kiriye . - Seyda Sadiq Behadînê Amîdî gotina (cînav) xebitandiye . - Feqî Huseyn Sagnîç gotiye (cînavk) - Dr. Qenatê Kurdo bi navê (cînav) aniye . - Şareza û zimanzanên Kurmanciya xwarê (Sorani) jî bi navê (ranaw) xebitandiye . - Hinekan jî gotina Erebi (zemîr) bikar aniye . Di vî warî de, min jî weku Dr. Qenatê Kurdo û S . Behadînê amîdî gotina (cînav) ji xwe re pesend kiriye . Hemû pertûk û gotarên rêzimanî yên ku piştî wan şarezayên binavkirî hatine der, ew jî di gêra wan navlêkirinan de mane . Anku her nivîskarekî zimên navek ji wan navan ji xwe re bijartiye û pê kar kiriye . Ev navlêkirinên têvel (ciyawaz) ku li mijara (pronom) bûne, ew jî weku gelek mijarên zimên ên dîtir tevheviyekê pêşberî xwendvanên zimanê kurdî peyda dikin . Ev tevheviyên aloz bi çalakiyên kesatiya yekane çareser nabin. Pêdivî ye ku dezgehine zanyarî hebin, ku kar û xebata çareser kirina hemû kêşe û arîşeyên zimanê me hildin ser milên xwe . Cînav di pertûkên rêzimanî de :

Çawa nivîserên rêzimana kurdî derbarî navlêkirina cînavan ne wekî hev gotine, wisan jî derbarî jimar û dabeşkirina wan cînavan ne weku hev gotine. Her zimanzanekî li gora baweriya xwe cînav parve kirine:

1- Mîr Celadet Bedirxan di “Bingehên Gramêra Kurdmancî” de cînav kirine (8) beşên sereke :

*Cînavên kesîn

*Cînavên îşarkî

*Cînavên girêkî

*Cînavên pirsiyarî

*Cînavên nebinavkirî

*Cînavên xwedîn (xwemalî)

*Cînavên berbihevîn

*Cînavên lihevxiştî

2-Seyda Reşîdê Kurd di “Rêziman a Zimanê Kurmancî” de, cînav kirine (6) beş :

*Cînavên kesok

*Cînavên nîşandan

*Cînavên arzî (milkî)

*Cînavên pêgih

*Cînavên pirsiyarî

*Cînavên nependî

Tiştonek



A: Mahir Berwarî

Hêke di nîva hinava, rengê wî
rengê jeng e
Şerkerekê pîrr sava, yê feqîr û
bê deng e
Dijît li dêm û ava, ne ew beqe
û nehing e

Çend metelok bi zaravê Soranî
(39)

Wekî min li serî amaje pêkirî,
bi hizara metelokên Kurdî
bi zaravê Soranî didestê min da
ne, lê li vir delîve nîne ku
hemiya belavkim. Min bi fer
zanî cend meteloka wek
mînak li vir çapbikim da zarok
û xandevanên kurmanc hay
jê hebin, mifa jê wergirin û ev
pirtûk e pê zengîn bibe.

- Jûrêkman heye tarîk tarîk,
pîrr e le zeng e qilîşey barîk.
(* Dem ûdidan)

Têdîtin: Amadekar destkariya
devoka metelokan nekiriye

Xwendevanên hêja!
Hûn dikarin bersiva
tiştonekan bi riya E-Maila
Agiri2003@gmail.com ji
me re bişînin



Demîrtaş: Ez 20 salên din jî girtî bim, ez serî natewînîm

Selahedîn Demîrtaş berbîjêrê posta serkomariya Tirkîyê ji girtîgehê ve peyama xwe ya derheq hilbijartinê belav kir

Demîrtaş berbîjêrê posta serkomariya Tirkîyê di vê peyama xwe ya vîdyoyî de, ku ji televîzyona fermî ya Tirkîyê ve belav bû, ew hilbjartin wekî derfetekê bi nav kir, ku hewce ye bi başî bê bi-karanîn, bona vê ku Erdoxan ji deshilatê vêde bavêjin.

Wî got: “Di dîroka siyasî ya me de, xaleke reş xûya dike, ku ew jî ew e ku mixabin ez bangewaza hilbijartinê ji girtîgeha cezayên giran a Edirneyê ve, bi neçarî pêşkêş dikim”.

Navbirî bi zelal gote xelkê Kurdistanê Bakur û Tirkîyê ku: “Ez 20 salên din jî di girtîgehê de bim, ez serî natewînîm. Xelkê Tirkîyê jî nabe deng bi-din Erdoxan û AKP’ê. Jiber ku hekî Erdoxan deng bîne, qedera 81 milyon kesî wê bikeve destê yek kesî de, û welatekî stemkar me wê hebe. Yanî eva hêsta destpêka zulmê ye, lê bi carek din danganîna Erdoxan zulm wê dest pê bike”.

Demîrtaş got: “Min serê xwe bo Erdoxan netewand, lewra li min nerehet bûye, û xeyidî ye”.

Wî rû li deshîlata Tirkîyê got ku: “Ew bona vê ku jiyana xwe ya loks ya di koşk û telaran de ji dest nedin, boxtanan li min dîkin, û gellek bêşermane vir û derevan dîkin”.

Demîrtaş berbîjêrê posta serkomariya Tirkîyê got: “Vê yekê ji bîra xwe nebin, ku Seyîdrîzayê Dersîm derheq deravan rû li deshîlatdarên Tirk got: Ez serî li van hemû firt û fêl, û vir û derevên we dernakim, lewra rastî vê bêbextiyê hatim, lê min qet serî li hemberî we de netewand, û bila eva ji we re bibe êş û derd”.

Piştî Demîrtaş got: “Lê baş bizanin ku ez ji vir û derevên we hesiyame”.

Demîrtaş got ku hekî hûn deng bidin me, wê demê ew çeteyên saxteçî û qesabên pile sê, ku tiliya xwe dirêjî we dikirin, hûnê bibînin ku çî ji destê wan nahê.

Wî got ku ewên jêve ne ku em bi girtin, û gef û kuştinê ditirsîn, gellek şaş in, jiber ku bixwe ketine nava rewşekê de ku ji sîbera xwe jî disilikin. Lewra emê wan di nav vê tirs û stresê de cih bihêlin, û dest di nav destên hev ber bi ronahiyê ve, emê bimeşin.

Di dawiyê de navbirî got:

“Em hemû wekhev in, lê di hemberî zulmê de em gellek bihêrs in, em Ehmed Kayayê bi neçarî derbiderbûyî ne, em Yelmaz Gunayê di nav zindanê de ne, bîr nekin, hekî yek kes ji me can bide, bi hezran kesên din wê ji dayîk bibin, û lêdan û gef û qirkirin nikare pêngavên me sist bike”.



We Seyîdrîza xapand, lê ez ji hîle û fêlên we hesiyame

Di dawiyê de wî berpîrsên TRT’ê bi tundî rexne kirin, ku ferq û cudahiyeke zaf xistiye navbera partiyên beşdar di hilbijartinê de, û wekî hev dem nedane partiyên, û bitaybetî HDP’ê, û

edalet berçav negirtine.

Lê destxweşî gote karsaz û zehmetkêşên TRT’ê, û got ku ew beşek nînin ji vê bêdadiya ku berpîrsên TRT’ê derheq wan kirine.

Hêjayî basê ye ku çend rojan berî niha Rêkxirawa Şefafiyeta (zelaliya) Navneteweyî raporek di vê derheqê de belav kir, ku li gora wê raporê, diyarîkirina wext bo partiyên weha bûye:

- Berbîjêrê Hevpeymaniya Komarî “Erdogan”: 105 deqîqe
- Berbîjêrê CHP’ê “Muharem Ince”: 37 deqîqe
- Berbîjêrê “IYI PARTI”, “Meral Akşener”: 14 deqîqe
- Berbîjêrê “SAADAT PARTISI”, “Temel Karamollaoglu”: 5 deqîqe
- Berbîjêrê “VATAN PARTISI”, “Dogu Perinçek”: 2 deqîqe
- Berbîjêrê HDP’ê “Demîrtaş”: 3 saniye

Her li gor heman raporê, dema belavkirina çalakîyên fîraksiyonan bi vî rengî bûye.

- AKP: 147 deqîqe
- CHP: 25 deqîqe
- MHP: 25 deqîqe
- “IYI PARTI”: 14 deqîqe
- “SAADAT PARTISI”: 5 deqîqe
- BBP (Partiya Yekbûna Mezin): 5 deqîqe
- “VATAN PARTISI” (Partiya Veten): 2 deqîqe
- “HDP”: 0 deqîqe

Rêxistina Şefafiyeta Navdewletî di rapora xwe de vî bêdadiyê di belavkirina çalakîyên partiyên de bi tundî rexne dike, û wekî şikestekê bo demokrasiyê di vî welatî de dibîne.